## Girîngiya hilbijartinê bo rêjîma Îslamiya Îranê

»»» R:4



## Zindîkirina Kultûra Eşîran li Urmiyê bi çi armanceke ?

»»» R:3

*Bidesţveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî

www.agirimedia.org Hejmar (463) 05-02-2024 Buha (1000) Tûmen

## Gelo Îran berpirsyar e yan ne!?

»»» R:5

## Rojavayê kurdistanê ber bi çarenivîseke nediyar ve diçe

»»» R:8

# BEŞDARÎ NEKIRIN DIKARE ÇI BIGUHERE?

Li vê demê ve ku rêjîma dagîrkre wilayeta feqîhî li Îranê de deshilat xistiye qorixa xwe de û bi nerewa li ser textê birêvebirina welatê belalêdayî Îranê rûniştiye, pirsyarek berdewam têtê pêş ku erê gelo li maşkanêya binav hilbijartinê li Îranê de beşdarî bête kirin yan ne?

Yekemîn binav hilbijartina ku li Îranê de birêve ço, hilbijartina cure deshilat yan binav rêfrandoma Komara Îslamî bû ku li wê rêfrandomê de hemî bijardên dine hatne wêdedanê û tenê bijardeyek ma ku ev jî "Komara Îslamî, erê yan ne" bû.

Herwekî li wê binav hilbijartina wê care a "meclisa Xubrigan" li 1402 a roji de li gelek cihan, û bi taybet li Xurasana Başûr de ku Îbrahîm Reîsî yê serkomarê rêjîmê berbijêre, tenê bijardeyek hêlane û evê dine dane wêde her niha de encam û serkevtiyê wê maşkanê yê xûya be! Li wê rêfrandomê de jî, tenê bijardeyek hêlabûn û li rastî de Xumeynî di cihê hemî kesê li hilbijartinê de beşdarî kiribû û êdî hewce nebû bijardeyekî din bête hizra kesê û bête berçavgirtin.

Li heyamê pitir ji 4 dehkan de, gelek caran û li hilbijartinên cuda li komara Îslamî de, xelk û siyasî bi ser 2 eniyan de hatine dabeşkirin, destpêkê de eniya yekim bihêz û berfireh bû û eniya duyem gelek lewaz bû, lê niha eniya duyem gelek berfireh bûye, eniya yekem li ser vê bawerê bûn bi heçî awayekê îmkan heye li hilbijartinan de pişikdariyê bikin heta ku ji rêka hilbijartinê ve, guhertinan pêk bînin.

Eniya duyem jî li ser wê bawerê bûn ku hilbijartin li sîstemekî dîktatorî de çi tiştekê naguhere û nabe li wê maşkanê de pişikdar be.

Destpêkê tenê Kurdistanê û hin cihên bertenge dine ye Îranê rêfrandom baykot kirin û eniya duyem pêkanîbûn û pitir ji %80 xelkê Îranê li eniya yekim de bûn, niha bow ê maşkanêya binav hilbijartina meclisa rêjîmê li meha Reşema 1402 an û salekê piştî şoreşa "Jîna" yê base hindê heye ku pitir ji %80 ciwatgeha netewên Îranê li eniya duyem de ne û kêmtir ji %20 li eniya yekim de mane.




Lê pirsyarekî bingehîn têtê pêş û rû li wan kesane ye ku li ser wê bawerêne beşdarî nekirin base, erê gelo hekî beşdarî li hilbijartina rêjîmê de çi tiştekê naguhere, lê beşdarînekirin çi tiştekê diguhere?

**Li derheq wê pirsyarê de dive em 2 tiştan bibêjin:**

**Yekem:** Ger bi awayê hizirmendî jî hin kesan nedizanî ku li wê rêjîmê de çi nayête guherîn, êdî bi awayê ceribandina pitir ji 4 dehkan da xûyakirin ku beşdarîkirin li maşkanêya hilbijartinê de, bi heçî nav û awayekê, çi naguhere.

Beşdarî nekirin jî li nava rêjîmê û mohrên rêjîmê de çi naguhere, lê di nava ciwatgehê de guhertinekî bingehîn çê dike! Guhertina beşdarînekirinê pêkhatiye ji guherîna hizirgeh û helwesta xelkê li hember sîstema hatî sepandin û jê dûrkevtin û çiyê din pê hivîdar nebûn û fikir kirin ji bo peydakirina rêkekî dinê!

Beşdarînekirina li sinaryoya rêjîmê, dikare te ji rêjîmê dûr bêxe û îrada hizirkirina serbixwe û biryardanê cem te bihêz dike û seha xebat û berxwedanê divejîne. Şoreşa Jîna yê encama siyasiye beşdarî nekirina li sinaryoya diyarîkirina Reîsî wek serkomarê rêjîmê bû. Beşdarînekirina li hilbijartina meclisa qelpe fermandên Sipahê jî li Zistana îsal de, dikare şoreşa mezintir ji şoreşa Jîna yê bi du xwe de bîne.

**Duyem:** Beşdarîkirin li sinaryoya hilbijartinê de çi tiştekê li rêjîmê de naguhere, lê heşemeteke zêde ji bona pirûpagenda rêjîmê çê dike ku bêje ciwatgeha cîhanî ku piştî ev hemî kuştara ku ez li ser netewên Îranê dikim, ev hêj aşiqê qamçiyên celada nin û bi hestekî zêde ve pêşwaziyê ji banghjiya celadan dikin.

Umeta hertim li meydanê de li ber çavê raya giştiye cîhanê dê nimayêş bike ku weke keriyên Pez kevtine bi dû weliyê feqîh.

Beşdarî nekirin hemî sehr û tilismên weliyê feqîh betal dike û wê demê cîhan dizane ku hemî tiştekî wê rêjîmê direv û qelp bûye! Wê demê dictator û hinek koseîlkbidetên xwe li nîveka meydana rastiyê de bi tenê û rût û qût dimîne.



# " Hîç "



**N: Nûredîn Sofîzade**



Ev peyva Hîç, piştî 45 salan hin kes jê têgeheşine û fêm dikin.

Dema ku xelk û gelên Îranê di sala 1357 a roji, şoreş û serhildan bi dijî rêjîma dîktatore Paşayetî kirin û gelek nekêşa ku Şahê Îranê ji welat rewî û welat bi cî hêla û Artêş êdî amade nebû ku çiyê dine xelkê bikuje, roja 12ê Rêbendanê Xumeynî bi piştgîriya dezgehên zaiyarî û istixbaratiye welatên xwedî bandore weke Amerîka, Birîtaniya û Firansê, bi Firokeyekî taybetî bo Îranê hate hinartin.

Hevdem dehan Rojnamevanên bîhanî ku rûmala geheştina Xumeynî dikirin, yêk ji rojnamevanan ji Xumeynî dipirse " Niha k utu vedigerî bo Îranê û şoreş serkevtiye, te çi hestek heye?" Xumeynî di bersivê de dibêje " Hîç" wate çine.

Dema ku xelkê bi sedema pirûpagenda hezaran Axundên li Îranê de bi qazancê Xumeynî û sivarbûna ser pêla hesta oliye xelkê, û derfeta ku bo Xumeynî hatî pêş, ev weke rêber didîtin, Xumeynî ti hestek li hember serkevtina şoreşê de çinebû, lewra got " Hîç".

Şoreş bi xwîna azadîxwazan serkevt, lê Xumeynî ev xwîn nedîtî girtin, ev geheştibû armanca xwe ya biyom û reş, wî baş she bi wê yekê kiribû ku xelk bi sedema kelêjana serkevtina şoreşê û hesta olî, care ji Hîça Xumeynî tênagîjin.

Xumeynî li yekemîn axivtina xwe de piştî geheştina bi Tehranê de, her li ser bingeha bavera xelkê, gelek soz û qewlên direwîn dane xelkê Îranê, Xumeynî ji bilî evê ku soz da dê Berq, Av, Otobûs, Xanîber, bi bê beranber bo xelkê dabîn bike, soz dida xelkê ku dê astê jiyana wan ya îro û axiretê jî xweş bike û dê wan bigehîne asta herî bilinde mirovatiyê.

Xumeynî û rêjîma wî ya dictator ne tenê çi yek ji sozên ku wê demê dane xelkê bi cî negehandin, belkû çend qat jiyana xelkê zêdetir ber bi dijwarî û rojreşiyê ve bir.

Wê demê piraniya xelkê ji mile hişmendiya siyasî ve gotinên Xumeynî baver dikirin û mixabin even baver nekirin, gelek kêm bûn. Gelê Kurd gerçi wê demê tenê bû û di rêza aliyê kêm bû, lê niha piştî derbasbûna 4 dehkan, piraniya xelkê Îranê têgeheştin ku ev "Hîç" a Xumeynî tê wê wateyê ku dê welat û xelkê rastî Hîç bike, çi jiyan û kesayetî û azadî, maf, xweşiyê bo wan nahêle.

**Niha piştî pitir ji 40 salan ji deshilata rêjîma Xumeynî, heyî û neyî ya welat, sermaye û dahata welat, hemî dest bi serde hatiye girtin û di cihê mecanî kirina Berq, Av, Otobûs û Mesken bo xelkê welat, tête xerckirin bo berfirehtirkirina îdolojiya kevnarperwerane a wê rêjîmê tête xerc kirin.**

Nanê ser sifrika xelkê Îranê biriye, bi Milyardan dolar xrecê xwedîkirin û teyarkirina dehan girûpên terorîstî li welatên dine de dike, li hember de para xelkê welatê belalêdayîye me, birsîtî, bêkarî, bihatî, girtin, kuştin, îşkence, sêdare, şer û malvêranî bûye.

Hemî serveta xelkê Îranê ji aliyê rêjîma terorîstperwer ve dest bi ser de hatiye girtin û xeric karê terorîstî, çêkirina çek û teqemenî, mûşean tête kirin ji bo armanca tevdanî û çêkirina şer û alozî û fitnê li welatên deverê de.

Wê yekê jî bandora rastevxwe danaye ser jiyana xelkê welat û ev rastî dehan diyardeyên bi jan kirine, amar cihê heyrîmanê ne, amara ji hevdu veqetiyana zevacan, amara xwekujiya ciwanên bê kar û dayîk û babên ku şermezarê Zarokên xwe ne, amara fehşa û laşfiroşiyê ku tête gotin temenê laşfiroşiyê geheştiya temenê 10-12 saliyê, amara diziyê, û tûşbûna bi madên hişber, amara firotina endamên laş weke Gurçik û yên dine. Destkevt û xelatê rêjîma Xumeynî û peyva wî a Hîç tenê tunekirina Xelkê û jiyana wan bû, yanî Xumeynî û rêjîma wî Hîç bo xelkê nahêlin.

Niha ku xelkê welat ji dest wê dîktatoriyê dinalînin, tenê yêk rêke heye ku bikarin bersiva "Hîç" a Xumeynî bidin, ev jî ewe ku ji nû vex elk ji bona geheştina bi armancên xwe ku azadî, demokrasî, jiyanekî serdem, tenahî, wekhevîyê, weke şoreşa sala 1357ê derkevin û text û bextê wê rêjîma ku Hîç bo xelkê nehêlaye, tev biherifînin û bigehne hemî wan xweziyên xwe ku jê hatibûne bêparkirin û wan Hîçên ji destçoyî, vegerînin û bibne xwediyê jiyana xwe ya jêhatî û dûr ji çavê dîktatoriyê weke xelkê welatên pêşkevtî, serbilind û azad bin.

Bêguman ger yekîtî û yekdengî di nava xelkê de çêbe ku heye, ger opozîsyonekî xwedî bandor û rêber hebe, geheştina bi wan xweziyan, ne gelek dûre.



# Zindîkirina Kultûra Eşîran li Urmiyê bi çi armancekê ?



N. Azad Kurdî

Di pêvajoya dîroka Kurdistanê de, dabeşkirina neteweya Kurd bi ser pêkhateyên biçûk weke hoz, eşîr û êlan xisarên mezin li doza Kurdistanê daye ku heta niha jî bandora wan ya nerênî li her 4 parçeyên Kurdistanê xuya dibe.

Ev yek çeka neyar û dujminên Kurdan bûye û bi armanca dabeşkirin û lawazkirina kurdan ev fikr û kultûrên paşvemayî di nav gelê kurd de belav kirine.

Piraniya gelên cîhanê xwe bi fakterên ziman, ax, çand û cografiya û … pênase dikin. Neteweyên modern û medenî ev qonaxên dabeşbûnan derbas kirine û weke neteweyekê jiyana xwe dimeşînin. Ji ber ku zêdeyî wan xwedî dewlet û desthilat bûne.

**Heta neteweyên Fars, Turk û Ereb li Rojhilata Navîn jî ku gellek pîlanên mezin birêve birine bona rakişandina Kurdan bo nav kultûra eşîr û êlan û paşde hêlane, xwe weke netewe pênase û rêxistin kirine.Ji ber ku ew dizanin ku neteweyek ku xwe bi pêkhateyên biçûk parve bike, ji taybetmendiyên netewî vala dibe û kultûra êl, eşîr û hoz û pêkhateyên biçûktir biqedirtir dibin. Bi wî awayî yekîtî, tebahî û hevgirtin li ser pirsên çarenivîsê yên girîng bo gel dijwar dibin.**




**Diruşma rêjîmê bi armanca zindîkirina êl û eşîran û valakirin îrada neteweya Kurd " Eşîr emegdarên rastîne rêjîmê "**

Piştî dehan salan jiyana me kurdan di nav pêkhateyên xêl, eşîr û hozan de, bi pîlanên dujminên kurdan li her 4 beşên Kurdistanê, nifşên nû gihîştin vê bawriyê ku xwe weke kurd û neteweyek pênase bikin.

Di van çend salên dawiyê de, rêjîma Îranê bi pîlanên Wezareta Îtilaat (Îstixbarat) û Sipaha Pasdarên rêjîmê hemû hewl û xebatên xwe xistine ser hev da ku aqliyet û çanda eşîran li Urmiye û herêmên derdorê bi awayekî berfireh û bi bername zindî bike û pêşde bibe.

Ev diyarde gelek berçav bûye. Bi awayekê ku nigeranî pêk aniye di nav beşeke zêde ji civaka Kurdî de ku xwe dûr û derveyî çarçoveya eşîran dibînin.

Rêjîm bi çêkirina mohrên taybet bo hindek serok eşîran li bajarê Urmiye û derdorê, rewayiyê dide wan kesên destnîşankirî û bi çend armancên taybet vê pîlanê pêşde dibe da ku di nav civaka Kurdistanê de bihên qebûlkirin.

Pêkhateya eşîrî berî her tiştî pêşiya xwe pênasekirina kurdan weke neteweyekê asteng û dijwar dike û civaka Kurdî vala dike ji hemû nirxên neteweyî û modern. Kontrola îradeya civaka Kurdistanê bi rêya van çend kesan bikin û eva ku dewlet dixwaze bi rêya mohreyên serok eşîr bi hêsanî cîbicî bike.

Bê hay ji vê yekê ku ev çand mala me Kurdan kavil dike û bi dehan salan paşde dihêle. Civaka eşîrî civaka nexweş e. Yek kes dikare bo sedan û hezaran kesan biryarên girîng bide.

Rêjîm dixwaze ku bi dabeşkirina kurdan bi ser pêkhateyên eşîr û êlan, wan weke paşketî nîşan bide û îradeya wan ya netewî lawaz bike û birûxîne.

Yekîtî û tebahî di nav civaka eşîrî dijwar e. Mixabin beşeke berçav ji van kesên ku rêjîma Îranê li bajarê Urmiye û derdorê pênaseya serok eşîriyê daye wan, ketine nava telikekê de ku xisarên pîlanên wan û rêjîmê karesatan çê dikin li ser pêvajoya netewebûna kurdan.

Pêwîst e ku nifşa nû ya civaka Kurdistanê xwe qed di nava pêkhateyên êl û eşîrî de pênase nekin û bi îradeyeke neteweyî pêşberî vê pîlana rêjîma Îranê û wan serok eşîran bisekinin.


Ev yek xeter û metirsiyeke mezin û micid e li ser civaka me û erkê me hemûyan e ku li hemberî vê pîlanê xebat û berevaniyê bikin.

Xwepênasekirina me weke kurd dikare çeka herî bihêz be li dijî vê pîlana gemar a rêjîma Îranê û hewce ye partiyên siyasî û civaka sivîl û rewşenbîrên kurd bi başî li ser vê pirsê bisekinin û vê pîlana karestbar vala bikin û ji nav bibin.



# Girîngiya hilbijartinê bo rêjîma Îslamiya Îranê





**N. Bêhzad Simko**

Rêjîma Îranê yek ji rêjîmên dîktatore mafiyayî li Rojhilata navîn de ye ku hçî alav û derfetekê bo man û geşedan bi hizrên xwe yên metirsîdar, bikar tîne û yek ji wan alav û derfetên herî girîng, ku rêjîm bi qazancê xwe weke rêka bi dest ve anîna rewayetiyê bo deshilata xwe mifahê jê verdigre, hilbijartine.

Rêjîma Îranê bo rewayetî peydakirina bo desthilta xwe, rêstkêşan bo dijberên xwe bi taybet bo aliyên azadîxwaz li hundirê Îranê û herwisa nîşandana hêza xwe bi dijber û alîgirên xwe li hundir û derveyî Îranê, hewcehî bi beşdariya xelkê li hilbijartinê de heye û bo rakêşana xelkê bo ser sendûqên dengdanê û komkirina xelkê li cihê dengdanê û belavkirina girtevîdyoyan li torên civakî û televîzyonên xwe û ragihandinên din ên cîhanê ji her şêwazekê mifah verdigre û kêmrengbûna rêjeya xelkê an beşdarînekirina piraniya herî zêde ya xelkê li wan hilbijartinan de li civaka cîhanî de dengvedanek nerênî bo rêjîma Îranê heye.

Li destpêkê de hewce ye ku em basek ji dîrok û armancên hilbijartinê bikin. Li serdema Yûnana kevin de li derdora 508 sal berî Zayînê, qewareke desthiltdariyê ku xelkê Yûnanê “Dêmorasiya” binav kiribûn ku bi wateya beşdariya rasterast a xelkê li desthilatdariyê de bû, bi rê ve diço û xelk li dor hev kom dibûn û li ser mijarên cuda danûstandin û gengeşe dikirin û piştre li ser vê yekê dengdan bi rê ve dibirin û encama vê dengdanê wek biryara desthilatê dihate hesibandin ku li vê serdemê zêdetir li ser pirsên leşkerî bûn û ew bi şêwaza refrandomê bû.

Ew sîstema ku ji aliyê piraniya herî zêde ya xelkê ve piştevaniya vê dihate kirin bo dîktatoran pirsgirêkek micid bû û heta şoreşa mezin a Feransê jî bi vê hegerê hate kirin ku xelkê dixwest li diyarîkirina paşeroja xwe de rol hebe û mafê diyarîkirina qedera xwe hebe û heta sîstema birêveberiya Komarî jî li ser vê binyatê hatiye danîn ku bi dengê rasterast a xelkê bi rê ve here.

Hilbijartin bi ser 3 beşan ve tê dabeşkirin ku bi kurtî ev in:
Cura yekem a hilbijartinê bo diyarîkirina cura sîstema desthilatdariyê ye, cura duyê bo yasaya binenetî ya welat û cura sêyem a hilbijartinê pêka yasayên erêkirî li yasaya binretî ye.

Li Îranê de û piştî şoreşa gelan a sala 1357 a Rojî, rêjîma Îranê bi pîlaneke qirêj xelk xapand û bi refrandomeke 2 bijardeyî ya “Erê ya Ne” li sala 1358 a Rojî de şoreşa gelan bi awayekê li ser navê xwe qurix kir û rêjîma Îslamî ya pêka hizrên xwe bi ser xelkê de sepand û bi cîhanê da xuya ku %98.9 a xelkê Îranê deng bi vê rêjîmê dane û bo xwe li civaka navnetewî de rewatî peyda kir û ji vê demê ve bi lidarxistina şanoya hilbijartina serkomar û şêwreya gund û bajaran û meclîsa rêjîmê, dixwaze bi cîhanê bide xuya ku vê deshilatê, rewatî heye.

Gotin li ser vê yekê gelek zêde ne û derfet bo wan mijaran li vê gotara kurt de nîne. Bi tenê dikarim îşarê bi vê yekê bikim ku pêka gotina civaknasan, dîktator bi hemû awayekê hewlê didin li jêr navê refrandom an hilbijartinan de dîktaroriya xwe perdepoş bikin û rêjîma Îranê heta niha ji vê yekê mifah vergirtiye û her carê bi navek bi qewimandina trajîdiyek an bi kesekî ku bikare piraniya xelkê bixapîne, xelkê bo ser sendûqên dengdanê rabikêşe, bo vê rêjîmê dengdan bi çi berbijêrekî jî bête dan girîng nîne çimkî ji berê, encama vê dengdanê endazyarî kiriye û tenê hewcehî bi kombûna xelkê li ber deriyê cihên dengdanê heye ku vê yekê nîşanî cîhanê bide.

Ji destpêka şoreşa gelan li Îranê, bi tenê Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê seh bi vê pîlana qirêj a rêjîma Îranê kir, lewma ew refrandom baykot kir û piştî zêdetir ji 40 salan, ji nû ve hinek aliyên siyasî îtiraf bi vê huşyariya Hizba Dêmokrat dikin.

Piştî şoreşa “Jin Jiyan Azadî”yê, piraniya xelkê Îranê bi taybet xelkê Rojhilatê Kurdistanê amade nînin ku beşdariyê li vê dengdanê de bikin û berpirsên rêjîma Îranê tevî îtirafkirin bi vê rewşê, hewlê didin bi rêyên cuda xelkê bo ser sendûqên dengdanê rakêşin.

Rêberê rêjîma Îranê çend rojan berî niha li îdiayeke çewt û bo ji rêderxistina xelkê îdia kir ku pirsgirêkên aborî li Îranê bi sedema beşdarînekirina xelkê Îranê ye û hekî xelk bixwaze pirsgirêkên aborî çareser bin hewce ye xelk beşdariyê li dengdanan de bikin, îdiayek wiha dûr ji rastiyê heta pêkenîna zarokan jî li pey xwe tîne û her kes li Îranê agehdar e ku sedema pirsgirêk û îflasa aboriya Îranê, rêjema gendel a Îslamî ye ku bi awayekî sîstematîk xelkê Îranê talan kiriye.

Wê rêjîma li Îran û cîhanê, rewatiya xwe ji dest daye û bo vê yekê hewcehî bi hatina xelkê bo ser sendûqên dengdanê heye û bi vê yekê rewatiya xwe li cem alîgirên xwe careke din bi dest bîne û ji aliyê din ve bikare bêdadî û serkut û kuştina xelkê, dizî, talan û zordariya bi ser kêmîneyên netewî û olî berdewam bike.

Bi wî awayî, çone ser sendûqên dengdanê, rewatîdan bi hemû cinayetên rêjîmê li Îranê û derveyî Îranê ye û xelkê Îranê hekî bixwaze temenê rêjîma Îranê kurttir bike, û xwe ji vê rêjêmê cuda bike, nabe li cihên dengdanê de amade be.



# Gelo Îran berpirsyar e yan ne!?



**N. Elî Munezemî**

Rewşa Rojhilata Navîn li wan çend rojên bihorî de aloztir bûye. Ew aloziyane piştî hêrişa li ser binkeyeke leşkerên Amerîkayî li devera sînorî ya Ordon-Sûriyê de ku bû sedema kuştina 3 serbazan û birîndarbûna 40 serbazên din bi hêrişa firokeyên bê firokevan zêdetir bûne. Her piştî wê hêrişê, Amerîka tiliya xwe dirêjî Îranê kir û ew sûçdar kirin ku ew hêrişa ji aliyê grûpên proksî yên ser bi rejîma Îranê ve hatine pêk anîn.

Karbidestên Amerîka her zû hatin ser xet û gefa tolhildanê kirin û ewan gefan bi xurtî bandora xwe danîn û şêweya helwesta Îranê û grûpên proksî yên ser bi wê rejîmê bi giştî guhert. Li hêlekê Îranê haşa li wê hindê kir ku dest li wî karî de hebe û li hêlek din jî çend grûpên proksî daxûyanî dan û çalakiyên xwe li dijî hêzên Amerîka dane sekinandin.

berteka Amerîka tenê li gefên devkî de nayê kurtkirin. Ewê yekê jî li alyekê sedemên xwe yên navxweyî hene û ew jî girêdayî bi rewşa siyasî a hundirê Amerîka ve heye ku ber bi hilbijartinên serokkomariyê ve diçin û li alyek din jî girêdayî bi rewşa siyasetên navneteweyî ve hene ku eger bihata û Dewletên Yekbûyî ye Amerîka hember wan terorîstan û grûpên proksî de qels û lawaz derbikevin, dikare bibe sedemê hirbûn û cesareta wan terorîstan û ew yeka jî xeterên mezintir li ser jiyana hêzên Amerîkayî li Rojhilata Navîn pêk bîne.

Piştî wan hemû gefên Amerîka û înkar û redkirina Îran û hindek grûpên proksî, Amerîka bi encamdana hindek operasyonên sinûrdar qenaet kir û ewê yekê jî heta niha hemû alyên têkeldar razî kirine. Di mediayan de hate ragihandin ku “Pentagon”ê hêrişa hêzên Amerîka bo ser herî kêm 125 armancan di ser axa Sûriye û Îraqê piştrast kiriye. Ji alyê karbidestên Îraq û Sûriye û hindek li wan grûpên proksî ve encamdana wan hêrişan hate piştrastkrin û bas li kuştina çend kesên çekdar û hindek xelkê sivîl hate kirin. Ew kara ji alyê wezareta derve a Rûsiyê, bi sedema aloztirkirina rewşa Rojhilata Navîn  hate gazinde kirin.

Lê ewa ku niha ciyê pirsyarê ye, ewaye ku çima Îran carek din karî bi hêsanî xwe li wê tehlûkê bifilitîne? Ewa li demekê de ye ku Îran ji alyê Serokkomarê Amerîka ve hate sûçdar kirin ku Îranê çek û amûrên pêdivî bo hêrişa li ser hêzên Amerîkayî bo grûpên terorîstî yên proksî radestî wan kirine. Serokkomar “Biden” got ku yên ew cinayeta kirinî, bê ceza namînin, Lê wî her wisa got ku ew li pey şereke mzin di Rojhilata Navîn de nînin.

**Ewa bi xwe hate wê wateyê ku Amerîka naxwaze hêrişî ser axa Îranê bike. Yanî Amerîka xwest bi wan êrîşên piçûk hem xwe li bin givaşa raya giştî a xelkê Amerîka derbaz bike û hem jî hêza xwe bide nîşandan ku bo ewlehiya hêzên leşkeriye wan li navçê de pêdivî bû. Bo demek kurt ew taktîka dikare bersivder be. Lê gelo ew yeka dikare bo demek dirêj armancên Amerîka pêk bîne?**

Ew nakokiya navbera Amerîka û Îranê û grûpên proksî yên girêdayî bi Îranê ve ne nakokiyên teze ne. Ew nakokiyane pêştir jî hebûn û ew yeka dizivire bo nerazîbûna Îranê li hebûna hêzên Amerîkayî li Îraqê. Îranê pêştir jî li rêka bombeyên qirax rêkan ve hêzên Amerîkayî dabûne kuştin.

 Lê wê carê ku hinde bi eşkere canê 3 Amerîkayîyan jê standin, ew nakokiyane asta wan bilindtir bû û «Baydên» jî ew hêrişên hêzên Amerîka li Îraq û Sûriyê bi destpêk da zanîn.



Ez baver im ku Amerîka bi wan êrişan xwest ku bi hemû aliyekê di Rojhilata Navîn de bide zanîn ku heke Amerîka hêzên xwe li navçê kêmtir jî kiribin, lê dema ku pêdivî be dikare carek din hebûna xwe li wê navçê de biselimîne.
Ewa jî kartek bihêz bû bo hemû wan grûpên proksî yên ser bi rêjîma Îranê ku dijî hêzên Amerîkayî û Îsraîlî çalakiyan dikin.

**Li ber ku niha Îsraîl mijûlê şerê li Xezê ye, Amerîka bi tenê nikare bi hêsanî hêrişî ser Îranê bike û ber hindê jî ewa ku serkomar «Baydên» got ku ew şerek mezin li Rojhilata Navîn naxwazin, gotinek gorekî rewşê rast û di berjevendiya Amerîka de bû. Lê hemû aliyek dibe bi başî wê rastiyê fam bikin ku heta rejîma terorîstî a Îranê hebe, Rojhilata Navîn rojek ewle û aram bi xweve nabîne.**

Hiloşandina wê rejîmê di xizmeta merivahiyê û xelkê navçê de ye û ew yeka jî li rêka xurtkirina şoreş û berxwedana azadîxwazane a neteweyên bindestê Îranê ve dikare pêkvere.

Kurtasî:

Piştî wan bûyerên wê dawiyê û hêrişa hêzên Amerîka bo ser çend grûpên proksî yên terorîstî ê girêdayî bi rêjîma Îranê, li ber hindek sedemên xasmanî, guhertinek mezin li Rojilata Navîn de pêk nayê.

Bo guhertinên bingehîn û kûr, dibe maka terorê ku rêjîma Îranê ye were hiloşandin. Bo wê yekê jî piştgiriya hêzên şoreşger û azadîxwaz yên neteweyên bindestê Îranê pêdiviye.



# Biryardar yekî din e, hilbijartin henek e






**N: Mojgan Elîpûr**
W. HESEN MUKEREM

Di hilbijartinên serkomariya Îranê yên sala 2013`an de, endamê Encûmena Çavdêriya Îranê Ebas Elî Kedxwedayî ji Hesen Rûhanî xwestibû ku Refsencanî ji redkirina wî agahdar bike. Rûhanî henekê xwe dike ku wê yekê ji Refsencanî re bêje, lê divê kî jê re redkirina wî bibêje? Herçend ku niha ev yek li serê Hesen Rûhanî de jî derbas dibe û bo vê dewra endametiya meclisa Xêbrgana Rêberî hatiye redkirin.

Roja Çarşemî 4ê Rêbendanê, yanî 10 sal piştî wê bûyerê, Hesen Rûhanî li ser rûpela xwe ya fermî ragihand ku ji aliyê endamekî Encûmena Çavdêriyê ve hatiye agahdarkirin ku nikare bibe berbijêr û Rûhanî heta niha 5 dewran li Meclisa Şêwra Îslamî, 3 dewran li Meclisa Xubirigan û 2 dewran jî bûye serkomar.

Bi nêzîkbûna hilbijartinên 11ê meha Reşemê yên Îranê re, berpirsên Komara Îslamî ya Îranê dîsa bi lez û bez di direjkirina temenê desthilata xwe de ne, û bi awayên curbicur bang li xelkê dikin ku beşdarî hilbijartinan bibin. Her çend li Îrana di bin desthilatdariya meleyan de hemî postek bi tenê rûberî ye û Weliyê Feqîh xwediyê desthilatdariya tam e.

**Lê, hilbijartin tenê şanoyek e ku çavên gel pê girêde û kumekê danê li serê cîhana navneteweyî û bêje ku em rewatiyê ji gel distînin. Lê di van salên dawî de helwestên gelên Îranê bi taybet tevgera Jînayê nîşan didin ku rejîmê rewatiya xwe ji dest daye û divê here. Helbet divê em bibêjin ku li Rojhilatê Kurdistanê her ji destpêkê ve xwedî wê rewatiyê nebûye û jê re gotin "na"!**

Li Îranê piştî derbasbûna zêdetirî ji çar dehkan li ser desthilatdariya, di bin hakimiyeta Komara Îslamî de, pêkhateya Komara Îslamî nehatiye guhertin, Li şûna wê de siyaseta êrîşkar û dagîrkeriyê pêş xistiye, destverdanê di karûbarên welatên herêmê de dike û li Rojhilata Navîn de dibe sedema alozî û tevlîheviyê û çekdarkirina milîsên xwe di bin navên cuda de, kirîza navxweyî kûrtir kiriye û dûkela agirê ku pêxistî dikeve nav çavên xelkê Îranê ,rejîm di hemû aliyên siyasî, aborî, çandî û civakî de di nava krîzeke mezin de ye û astê pirsgirêk û kirîzan roj bi rojê mezintir û mezintir dibin.

Hilbijartinên azad yek ji bingehên dêmokrasiya her welatekî ye, lê pirs ev e ku gelo ya ku li Îranê tê lidarxistin, hilbijartinek azad e?
Rejîma siyasî ya niha ya Îranê her li destpêkê bi bername siyaseta xwe darêtiye.

Desthilatek dîktatorî ye, lê dîktatoriya ku bi nîşaneyên dêmokrasiyê bi awayekî formalîte tê meşandin û tê îdiakirin ku hilbijartin ji bo desthilatdariya siyasî girîng e û rikeberî di nav de heye, Lê di dawiyê de hemû hêz vedigere bo destê yek kesî, Weliyê Feqîh, ku di vê parzûnê re derbas bibe.

Piraniya îraniyan ji ber ol, meseb û neteweya xwe û her wiha ji bo jinan û kesên ku bi prensîbên Weliyê Feqîh bawerî nebin, ji vê parzûnê derbas nabin. Dema ku wisa ye hilbijartin li Îranê tenê amûra rewatîdana yasayî bi rejîmê ye.

**Lê, tiştê ku vê hilbijartinê ji hilbijartinên din cuda dike ew e ku civaka Îranê di warê hişmendiya siyasî û rûbirûbûna rejîma dîktator de derbasî qonaxeke nû bûye ku di Tevgera Jînayê de gihîştiye gupka herî bilinde xwe**

Ji aliyekê ve yekîtiya gelên Îranê li dijî rejîmê ji her demê zêdetir rûçkê veşartiye Komara Îslamî nîşanî cîhana navneteweyî daye û Ji aliyeke din ve asta tepeserkirin û tundiyê li dijî daxwazên ser şeqaman hêrsa xelkê li dijî rejîmê zêde kir û xelkê êdî baweriya xwe bi çaksaziya sîstema siyasî ya Îranê nemaye û daxwaza jinavçûna rejîmê dikin, ku ev yek bi serê xwe bêparkirina rewatiya ku Komara Îslamî bi pîlan cehdê dike bidest bixe .

Ji ber vê yekê redkirina mafê Hesen Rûhanî ku bi xwe bi salan postên bilind li welêt hebûne û desthilatdar bûye, Ev nayê wateya hatina kesekî ji wî baştir, belku hîleyek nû ye ku kirîzên kombûyî yên Îranê li ser bêhêziya serokekî bi nav bike û soza reforman bide xelkê, Lê niha gelê Îranê dizane ku ji berbijêrên ku parzûna Encumena Çavdêriyê derbas dikin xirabtir tiştek nine, tev xerab in û hêviya guhertinê di nava vê rejîmê de nîne.



## Nerîna



**“Muštafa Ozçelîk”:**

“Muštafa Ozçelîk: Em dereng nemanin, werin em namzedên xwe bi hev re tesbît bikin, werin em bajarên xwe bi hev re îdare bikin!”



**“Daniel Hagary”:**

“Daniel Hagary: Hizbula li ku be em ê li wir bin. Li Rojhilata Navîn li ku hewce be em ê tevbigerin ”



**“Joe Biden” :**

“Joe Biden: Her Kesê ku Zararê Bide Amerîkîyekî Wê Bê Ceza Nemîne”



**“Samuel Worberg”:**

“David Cameron: Hewce ye ku em peyama herî zelal a gengaz ji Îranê re bişînin da ku ew zanibin ku tiştê ku bi riya girûpên bedel encam didin nayên qebûlkirin”

## Roja zimanê dayîkê nêzîk dibe lê ji bo Kurdan hertim roja zimanê dayîkê ye!



**N. Eskender Ceiferî**




Kurd li her perçeyek Kurdistanê bi awayekî di bin zulmê de ye.
Li Rojhilat, mînaka herî ber biçav, girtina Zara Mihemedî, Seywan Îbrahîmî û mamosteyên din ên zimanê Kurdî ye.
Roja 21’ê Şibatê ji aliyê Neteweyên Yekbûyî (NY) ve weke “Roja Cîhanî a Zimanê Dayikê” hatiye erêkirin û pejirandin û di sala 1999´an de ji aliyê UNESCO’yê ve hat erêkirin.
Ew roj, di encama xwepêşandanekê de hate destnîşankirin ku li Pakistanê ji bo zimanê dayikê ji aliyê ciwanên xwendevan ve hatibû encamdan û di xwepêşandanê de çend ciwan jî hatibûbûne kuştin.
Lê ne tenê ev roj, lê belê hertim ji bo Kurdan roja zimanê dayikê ye. Ev sedan sal in ku Kurd ji mafê xwendin û nivîsandina bi zimanê xwe bêpar in, ew têne koçberkirin jî, lê dîsa jî zimanê xwe wenda nakin.

Kurdên Xurasanê ku di 3 qonaxan de ji zêdetirî 500 salan beriya niha ve ji Kurdistanê ji bo wir hatine koçberkirin, mînakeke baş in ku nîşan dide Kurd ji zimanê xwe xwedî derdikevin. Ew hertim rastî hewlên asîmîlekirinê weke qirkirinên siyasî û çandî û zimanî hatine lê dîsa jî ziman û çanda xwe parastine.

Herî dawî ew ji beşdarîkirin di fêstîvala bîranîna Elîşah Xan Heyderîzade helbestvanê Kurd de bêpar bûn. Di fêstîvalê de nivîskarên Kurd ji Hemedan, Loristan, Urmiye, Sine, Kirmaşan û Îlamê beşdar bibûn.
Ev rêgirtin, binpêkariya yasayên maf û azadiyan e ku li gora wan, her kes bêyî ku ji ber ziman, ol, baweriya siyasî yan jî yeke din jêbûna neteweyî û yan jî civakî, mal, zayîn an jî rewşeke din bibe, xwedî sûdwergirtina ji hemû maf û azadiyan.

Ew piranî ji herêmên bakurê Kurdistana Rojhilat in. Her ji dema desthilata Mannayan ve di sedsala 9’an a beriya zayînê ve ew li Kurdistanê xwedî bandor bûn. Di dema çêbûna Împêratoriya Madan de rengê cudahiyên li navçeyê û dîsa jî tevlîbûna hêzan derdikeve ku Kurdên Kurmanc jî yek ji wan in.

Dem derbas bû û desthilat bû a Şîeyan. Di salên derdora 1590’an a Zayînê de hewla koçberkirina Kurdan ji Urmiye, Xoy, Makû û Selmasê ji bo Xurasanê dihat dayîn. Ew di salên di navbera 1598’an de heya 1602’an ên Zayînê ji bo Bakurê Xurasanê hatin koçberkirin da ku welatê Farsan biparêzin. Ew koçberkirin di encama civînekê de hat ku di navbera Şah Ebbasê Sefewî û mezinên Kurdan re hate lidarxistin û serokhozên Kurd bi Sefewiyan re li ser koçberkirina wan lihev hatin. Beriya wê di şerê Çaldiranê de ku di sala 1514’an de çê bû, Kurdistan bibû du perçe. Di hemberî koçberiyê de hatibû misogergirin ku wê mafê wan li Xurasanê parastî be.

**Ev cara yekemîn nîn e ku astengî li hemberî çalakiyên Kurdên Xurasanê çê dibin. Beriya niha jî, wezareta Çanda Îslamî ya Îranê, rê nedabû fêstîvaleke Kurdên wê navçeyê bê lidarxistin. Fêstîvala Pîran Çengî ku her sal li bajarê Qûçanê li Bakurê Xurasanê birêve diçû û tê de hunermendên Kurd ên vê herêmê û bi taybetî kesatiyên naskirî ên mûzîka kevn a vê herêmê beşdar dibûn, sala derbasbûyî pêşî lê hate girtin û derfeta birêveçûnê jê re nehat dayîn. Ev di demekê de bû ku ji bo wê fêstîvalê ji aliyê Kurdên wê herêmê ve xerceke zêde hatibû mezaxtin.**

Ev kiryar jî hemû bingehên Danezana Gerdûnî ya Mafên Mirovan binpê dike ku li gor wê, mafê çalakiyên welatiyan bêy liberçavgirtina sîstema dadwerî yan sedemên din ên weke qewmiyet, netewe, dîn yan bawerî, heye. Lê ne koçberkirinê û ne jî bêparkirina wan ji van çalakiyan, nekariye û nikare zimanê wan ji nav bibe.

Weke ku çawan Mihemed Neqî Lutfî nûnerê Elî Xaminêyî li parêzgeha Îlamê ya Rojhilatê Kurdistanê û pêşnimêjê bajêr dibêje, nabe zimanê Kurdî û nivîsa Kurdî li Îlamê hebe û divê pêşiya wê yekê were girtin, li Xurasanê jî heman rewş heye. Cîgirê parêzgarê Xurasana Bakurî di civînekê de ragihandibû ku dijberên Komara Îslamî dixwazin hesta nasyonalîstî anku hesta neteweyî di nav xelkê vê parêzgehê de çê bikin. Wî berpirsê pilebilind ê rêjîma Îranê ji saziyên ewlehî xwastibû ji bo bêbandorkirina partiyên Kurdî li wir tevbigerin. Gotinên bi wî rengî hertim rastî nerazîbûna çalakvanan tên lê di hember de cihê wan çalakvanan dibe girtîgeh. Ev dujmin, baş dizane ku ziman, hebûna me ye.

Rêjîma Îslamî ya Îranê bi van kiryarên xwe, benda yekem a Danezana Gerdûnî a Mafên Mirovan bi bêparkirina xelkê ji azadiyan binpê dike. Ji ber ku standina mafê çalakiyên zimanî û çandî jî beşek ji binpêkirina azadiyê ye. Herwisa benda duyem jî ku amaje dike ji ber statuya siyasî, hiqûqî an jî ya navneteweyî di navbera mirovan de cudayî nayê kirin û welatî li cem dewletan divê wehkev bin, binpê dike. Çimkî li vir maf, tenê ê neteweya serdest e û neteweyên weke Kurd, Ereb, Azerî û Belûçan ji her çalakiyeke wêjeyî, zimanî û çandî bêpar in.

# Rojavayê kurdistanê ber bi çarenivîseke nediyar ve diçe



**N: Ebdulezîz Qasim**



Rojavayê Kurdistanê her ji sala 2016an ve, rûbirûyê sê operasyonên leşkerî yên mezin bûye, ku Dewleta Tirkiyê her ji destpêka krîza Sûriyê ve, maf û hebûna miletê kurdî armac dike bi behaneya dûrxistina PKK ji sînorên xwe.

Hêzên Tirkiyê û grûpên opozîsyona Sûriyê yên ser bi Tirkiyê ve, ku niha çend navçeyên giring û berfireh yên Rojavayê Kurdistanê dagîr dikin, bi pêkanîna siyasetên asimîlasyon û guhertina dêmografî li dijî gelê kurd li wan navçyên dagîrkirî.

Herwiha ji sala 2019'an ve, navçeyên din yên Rojavayê kurdistanê bi awayekî rojane bi giranî bi firokeyên bê firokevan bombebaran dike, dîsa bi armanca koçberkirin û jinavbirina Gelê kurd.

**Goman di wê yekê de nîne, ku Tirkiyê Gelê Kurd armanc dike û nejî PKK bi taybetî ku êrîşên wê yên vê dawiyê vê yekê piştrast dike, eger em vegerin êrîşên wê bi taybetî êrîşên Tirkiyê yên di rojên 13,14,15/01.2024, ku pitir ji 80 saziyên elektrik û neft û gazê û ava vexwarinê bi awayekî hovane hatin bombebarankirin ku wisa dide xuyakirin ku Tirkiyê bi wî awayî binyat û çavkaniyên jiyanê û debara xelkê armac dike, ku ev tawanên weha yekesr dikevin di rêza tawanên şer de, ku îro piraniya gund û bajarên deverên kurdî ji Dêrikê heta Kobanî bê av û sûtemenî û bê sadetirîn xizmetguzariyên destpêkî û pêdiviyên jiyanê ne û di tariyê de dijîn!**

Helbet dihat xwestin ku ev tawan ji aliyê civaka navdewletî û herwiha ji aliyê saziyên Neteweyên Yekgirtî hatiban şermezar kirin, lê mixabin hemû aliyên dewletî bêdeng bûn, tevî ku ji aliyê Rûsiya, Ewropa û Amerîka ve nehatine şermezar kirin, bi taybetî bêdengiya Amerîka cihê pirsek mezin e, ji ber ku hêzên HSD wekî hevpeymanê xwe dibîne, tevî ku li gorî hindek çavkaniyên navxweyî yên li Rojavayê Kurdistanê, ku ev êrîşên Tirkiyê li ser jêrxana bingehîn û statoyên gaz û neft û av û elektrikê bi agehdariya Hêzên Amerîka hatine pêkanîn!

Lê ji berî ku em daxwaza şermezarkirina tawanên Tirkiyê û çeteyên wê ji Ewropiyan, ji Amerîkayîyan û Rûsan bikin, pêdiviya pirs ji Rêveberiya xweser bibe ji bo çi pend û aqil nagire ji ezmûnên xwe yên şikestî? herwiha pêdiviye aliyên kurdî yên din bersiva bêdengiya xwe bidin? bi taybetî ku ev pirs ji wan partiyan tê xwestin yên xwe bi (projeyê neteweyî) didin nasîn, ku ji bo çi ev tawanên han ji aliyê wan nayên şermezar kirin, hevdem heman pirsyar ji Revenda Kurdî ya Rojavayê kurdistanê tê xwestin?

Pêdivî bi şermezarkirina bêdengî heye, tevî ku ez di wê baweriyê de me ku ev partî nayên guhertin û bi tenê bi bazirganiya xwe difikirin û heta noqa xwe di gendeliyê de niqom bûne, ku ev bûye rastiyek û nayê veşartin û piraniya miletê kurd yê Rojavayê Kurdistanê ji partiyên kurdî bêhêvî û bêzar bûye, û ez wekî kes naxwazim êdî li ser wan, li qelsî û rûreşiya wan binivîsim, ku nivîsîna li ser wan hîç biha û giranî nîne, heta bihayê kaxez û xamava pênûsa li ser wan dinvîse nîne, ji ber wan hîç îradeyek yan kesayetiyek serbixwe nîne, tevî ku bi rastî bûne bargiranî li ser miletê kurd û doza wê ya neteweyî.

Li gorî rewşa niha ku çi rêk û bijardeyek li pêş kurdên Rojavayê kurdistanê nîne ji bilî xwidankirina hizr û îradeyeke nû li ser bingeha berjewendiyên neteweyî yên gelê kurd li Rojavayê kurdistanê û herwiha xwidankirina kesayetiyeke siyasî ya neteweyî serbixwe, lewra ji bo vê yekê pêdivî bi alav û mîkanizmên nû heye heta miletê kurd bikaribe xwe ji nemanê rizgar bike û derbirînê ji maf û hebûna xwe bike û bibe nûnerê rasteqîn yê gel û xaka xwe.



# Mafê Jinê tenê diruşme û bes!



**N. Vênûs Fayîq**
**W. Hesen Mukerem**



Divê em nêrîna xwe ya li ser xwe ji nû ve ava bikin, Divê em weke jin xwe bi rêve bibin û xwe pêş bixin.
Her çiqas hê zû ye ku meriv qala 8ê Adarê bike, lê her 8ê Adarê weke wê ye ku min ji bîr kiribe ku ez jin im, dê şiyar bibim, mîna ku min ji bîr kiribe ez jin im, mîna wê ku di hemû rojên din yên salê li dunyayek din de razabim, di 8`ê Adarê de min hişyar dikin, ji min re dibêjin ku tu jinî.

Dîsan deng bi durişmên daxwaza mafên zêdetir bo jinan bilind dibin, û siloganên azadiya ji zilm û zordariya li ser jinan deng bilind dikin, di wê rojê de mafên jinan bi dest xistine û yên ku heta niha bi dest nexistine tên nivîsandin.

Çawa ku jin li yarîgehekê li dijî lehengekî ezelî radiweste, jê re jî mêr tê gotin, ew leheng e ku hemû cesaret, qehremanî, jêhatîbûn, cesaret û her tiştê ku di dirêjahiya dîrokê de bidest xistiye, li ser navê wî zayenda mêr daye.

Desthilat, dewlet, siyaset, ol û civak bi giştî, ev mêre ku hemû hêz ji sînga wî diherikin, tevahiya rêyan li ber lingê wî dest pê dikin, tevahiya aqil û hiş li serê wî derdikevin, tevahiya desthilatên siyasî li ber destê wî de kom bûne û hemû ronahiya li ser rûyê erdê li destên wî de kom dibin û belav dibin, hemû dîrok ji aliyê wî ve hatiye nivîsandin, hemû mîrat bi îradeya wî tên parvekirin, hemû olan zayenda wî hildigirin, hemû çand rengê wî digirin û … hwd, mîna vê ku jin mexlûqek ji tixmê mêran cuda be.

Mîna ku jin ji gerstêrka din daketibe û zilamên bi rûmet xwediyê axê bin, jin gerîla ne û di bin erdê de şer dikin, her sal vê têkoşînê bi bîr tînin û xwedî dîrokek taybet in.

Her sal li ser destkeftî û têkçûnên jinan, li ser paşeroja mexlûqê ku qaşo jin be û qaşo daxwaza mafan dike, danûstandin tên kirin.

Mîna ku jin parçeyek axa ku hatiye dagîrkirin be, an jî çend dilop Av be ku şer li ser tê kirin û tê kuştin.

Li ser navê olê ku bi tevahî îdeolojiya mêranî aniye, hemû pêxember zilam in, hemû pirtûkên esmanî bi zimanê mêran hatine nazilkirin, li ser navê vê olê tê darizandin, cezakirin û ji mafan tê girtin.

Ev ne reşbînî û ne jî zêdegavî ye, bav û kalên me hînî me kirine ku ev dereweke bi hezar salan e û me jê bawer kiriye.

Ma ne ew e ku 8ê Adarê ji bo me destnîşan kirine û her sal destkeft û mafên me dihesibînin?

**Ez hîna jî fam nakim çima jin ji ber ku jin in her tim divê bên berevanîkirin!?**

**Mîna ku jinbûn tiştekî li derveyî qada mirovahiyê ye, mîna ku jin tişteke ku bahozan di gel xwe anîbe.**

**Çima berevaniyê jê nakin ji ber ku ew mirov e? Kîjan wateya wê ya berfirehtir e, jin bûm an mirov bûm li asta milê mêr de? Çima rojek bi navê roja mêran nayê desnîşankirin?**

Ji ber ku mêran xwe kirine xwediyê hemû roj û deman, ji ber ku mêran serdestî li hemû roj, dem, cih, dîrok, dar û kevirên jiyana me kirine, ez çawa dikarim cihê mêran di desthilatdariyê de bigrim û jê re îspat bikim ku ez im. Tiştek ne kêm e, heke ez jê re îspat nekim ku ez mirovek mîna wî me? Ger ez her sal jê re bibêjim ez jin im, lê ji bîr neke ku di hember wî de biqîrim û bêjim ez jî mîna wî mirov im.

Tişta ku ez li vir dixwazim bibêjim ne redkirina zayenda jinê ye, redkirina çanda ku mohra mêraniyê hildigire û çanda ku her tiştên ku zayenda nêr hildigire bi rûmet dike.
Ez daxwaza vê dikim ku mohra mêr ji her tiştî bê rakirin û ji bo ku mesafe li pêşiya jinan firehtir bibe mohra însanî bê çêkirin.

Ji bo ku ez daxwaza rakirina ramana mêraniyê bikim, divê ez ramana femînîzmê nekim..

Divê ez daxwaz bikim ku hemû çand û ramanên mêranî ji holê rabin û li şûna wê zimanê mirovatiyê bê bigire. Ji bo ku tu zayend careke din nekare zayendek din biçewsîne, şûnda ramana mirovahiyê bigire.

Jin di tu tiştî de ji mêran kêmtir nînin, ne di warê civakî de, ne di warê siyasetê de, ne di warê perwerdehiyê de, bi ti awayî ku nikaribe di asta mêran de bisekine û bi qasî ku berhemdar be, bixebite.

Lê belê bi hinceta ku jin e û ne kêrhatiyê gelek berpirsyariyan e, xwe di bazna teng a bi navê bazna jinê de, xwe ji gelek qadan dûr dixe.

Di dîroka têkoşîna jinê ya ji bo wekheviya mêran de ev yek her tim zirareke mezin daye dirûşmên wan û weke mirovan zilmek mezin li xwe kiriye.

Ev yeka jî ku gupka daxwazên jinan dabîn dike, wekhevî ye, ji ber ku veqetîna li ser navê bazineya jinan li hemberî mêr, me nake mêr.
Ger em di heman çemberê de li kêlega hev rawestin, em ji du mirovan zêdetir in, ne kêmtir in.



# Em dereng nemînin



N. MISTEFA OZÇELÎKE

**MUSTAFA OZÇELÎK SEROKÊ GIŞTÎ YÊ PARTÎYA WELATPARÊZÊN KURDISTANÊ (PWK):**

werin em namzedên xwe bi hev re tesbît bikin, werin em bajarên xwe bi hev re îdare bikin!.

Di 31ê adara 2024an de wê li Bakurê Kurdistanê û Tirkîyeyê hilbijartinên şaredarîyan pêk werin. Tevî liberçavgirtina hemû tecrûbeyên heta niha yên di warê hilbijartinên şaredarîyan de, divê em bi awayekî nû û nexşerêyek taybetî, xwe ji bo hilbijartinan amade bikin. Bi vê armancê, em dikarin li Bakurê Kurdistanê, li hemû parêzgeh, qeza û beldeyan namzedên serokê şaradaran û namzedên meclîsên şaredaran, li gorî şertên taybet yê her bajar û navçeyê, partî, tevger û grûbên sîyasî, hemû dezgehên sivîl, meslekî û civakî û girseyî, komeleyên mehelî, sendîqa, kesayetên civakî yên xwedî bandor, nûnerên dezgeh û komeleyên jinan, serokên berê yên şaredarîyan, endamên encûmenên wîlayetan yên xwedî tecrûbe, perwerdekar, akademîsyen, pisporên birevebirina şaristanîyê, pisporên plan û hawirdora şaristanîyê, zanyarên dîrokî, zanyarên kultur û zimên, hiqûqnas, ekonomîst û sosyolog, em platforman ava bikin. Wan platformên herêmî, li gorî van prensîb û hişmendîya rêveberîya herêmî yên ku li xwarê me destnîşan kirine, dikarin berendamên şaredrîyan tesbît bikin û ji nav wan berendman jî namzedekî ku herî baş bikaribe şaredarîyê îdare bike hilbijêrin. Namzedê hevbeş, divê kesekî weha be ku, di derbarê wî de tu şaîbe tunebe, kesekî, naskirî, qebûlbar be. Divê, li gorî şert û rastîyên taybet yê her bajar û navçeyê yên etnîkî, dînî, mezhebî, civakî, çandî, namzedekî ku şaredarîyeke demokratîk, rêzê li maf û azadîyên hemû pêkhateyên civatê bigre, şaredarîyeke pir zimanî, pir lehçeyî, pir kulturî qebûl bike. Divê bi awayekî vekirî, şefaf, bêşaîbe ji alîyê mirovên wî bajarî ve bê hilbijartin û bibe namzed. Di şaredarîyên bajarên Bakurê Kurdistanê de, divê şaredarî nasnameya kurdî û zimanê kurdî bi awakî resmî qebûl bikin. Divê navê bajar, navçe û hemû cîh û warên bi kurdî, li gel navên bi tirkî bêne bikaranîn. Divê şaredarîyên me bi awakî çalak bixebitin ku perwerdeya bi zimanê kurdî (kurmancî û kirdkî-zazakî), mafên azadiya ramanî, olî, bawerî, xwerêxistinkirin û xweîfadekirinê di Qanûna Esasî de bê qebûl kirin û bi qanûnên peywendîdar bê misoger kirin û cîhê mezelê Şêx Seîd, Xalid Begê Cibrî, Seyîd Riza, Seîd Nûrsî û hemû kesayetên Kurd yên ku cîhê mezelê wan ne dîyar in, ji alîyê Dewleta Tirkîyeyê ve bêne aşkere kirin. Anko di rêvebiriya şaredarîyên bajarên Kurdistanê de, divê pirzimanî, pirkulturî, pirrengî, pirdengî, şefafî, xweşbînî û hevahengîya civakî bibe rêziknameya bingehîn. Ev dikare bibe protokola me ya siyasî ya hevbeş da ku em bikaribin bi îradeya hemû pêkhateyên Kurdistanê bingeha îdarekirina bajarên xwe ava bikin. Sîyaseta Dewleta Tirkîyeyê ya tayînkirina qeyûman û destdanîna ser îradeya xelkê bi tu awayî nayê qebûl kirin, qeyûm tune hesibandina îradeya gelê wî bajarî ye. Helbet ku, mafê her partîyê ye ku bikaribe bi serê xwe beşdarî hilbijartinan bibe, Lê li gorî me, ya herî rast, pêkhateyên herî berfireh yên wî bajarî bikaribin li ser bernameyeke hevbeş namzedên xwe bi hev re tesbît bikin. Lê aşkereye ku di tesbîtkirina namzedên şaredarîyan de, divê tu kes namzedên ne ji wî bajarî ne û rêzê li pir zimanî, pirolî, pirmezhebî, pir kulturîya wî bajarî nagirin li ser kesî ferz nekin û divê rê vekin ku bi awayekî hevbeş, azad û dêmokratîk namzed bêne tesbît kirin. Bi tesbîtkirina namzedên hevbeş û bi hevre îdarekirina bajarên xwe, em dikarin bingehê xweîdarekirina kurdan ava bikin, Em dikarin hilbijartinên şaredarîyan yên 2024an bikin destpêka ava kirina bingehê ”Şertê Xweserîya Birêvebirîya Herêmî ya Ewropayê”, bi vê bîr û bawerîyê em dikarin siyaset û xebatek hilbijartinê ya berfireh û hevbeş bimeşînin û divê em bimeşînin. Di şaredarîyeke ku bi diruşma “Werin em namzedên xwe bi hev re tesbît bikin, werin em bajarê xwe bi hev re îdare bikin!’’ potansîyela herî berfireh ya ku wê civat lê xwedî derkeve de, di mijarên perwerde, tenduristî, civakî, dînî, mezhebî, xizmetên dînî, mezhebî û şaredariyê de dikare projeyên mezin




bêne çêkirin, dikare bingeha xwe bi xwe îdarekirina kurdan bê ava kirin. Ev perspektîfa bi diruşma, “Werin em namzedên xwe bi hev re tesbît bikin, werin em bajarê xwe bi hev re îdare bikin! ku em pêşniyar dikin, herweha li himberî wê îhtîmala ku Dewleta Tirkîyeyê qeyûman dayne ser şaredarîyan jî dê wezîfe û roleke herî gelekî xurt û bi bandor ya parastinê bilîze. Di îhtîmala ku qeyûm bêne danîn ser şaredarîyan de, potansîyela herî berfireh a sivîl, sîyasî, meslekî, demokratîk, civakî dê li namzedên xwe yên li gorî vê pêşniyarîya me, li ser esasê çerçoweyeke sîyasî û bernameyeke xebatê ya bi awayekî hevbeş bêne dîyar kirirn xwedî derkevin, Dewleta Tirkîyeyê jî dê weke niha dê nikaribe bi hêsanî qeyûman dane ser şaredarîyan. Bi vê pêşniyara me ya li ser esasê çarçêweyeke sîyasî û bernameyeke xebatê ya maqûl û hevbeş wê potansîyela herî berfireh ya sivîl, sîyasî, meslekî, demokratîk, civakî li namzedên xwe xwedî derkevin û wê dewlet jî nikaribe bi vê hêsanîyê bi rêya qeyûman dest dayne ser şaradarî û îradeya xelkên bajarên me. Heger namzed bi îradeya potansîyela herî berfireh ya civatê bêne dîyar kirin, bi destê wê potansîyela berfireh, bi hêza sedhezaran, wê bingeha parastina destkeftinên şaredarîyan jî xurtir bibe. Em bangî hemû dezgehên sivîl, partî, tevger û grûbên sîyasî û kesayetên qebûlbar yên bajarên xwe dikin ku ji bo destpêkirina pêvajoyeke weha em bi hev re gavê bavêjin. Li Bajarên Metropolên Tirkîyeyê Platformên Herêmî yên Kurdan, Werin em li bajarên metropolên Tirkîyeyê yên ku nifûseke zêde ya kurdan lê hene, em Platformên Herêmî yên Kurdan (weke Platforma Kurdên Stenbolê, Platforma Kurdên Îzmîrê, Platforma Kurdên Mêrsînê û hwd) ava bikin. Li bajarên metropolên Tirkîyeyê yên ku nifûseke zêde ya kurdan lê hene, em dikarin, bi beşdarîya dezgehên sivîl, partî û grûbên sîyasî yên kurdan, nûnerên jin û ciwanên kurdan, karsaz û ji hemû beşên civatê kesayetên qebûlbar ên kurdan platformên herêmî ava bikin. Wan platformên herêmî, di derbarê ziman û kultura kurdî, maf û azadîyan, perwerde, tenduristî, piştgirî, lihevxwedîderketina di nava kurdan de, di bajarên metropolan de dikarin wazîfe û rola wek Organîzasyona Temsîla Kurdan bilîzin. Dikarin di dema hilbijartinan de wek alîyê kurdan bi hemû partîyên sîyasî re hevdîtinan bikin, li ser esasê qebûl kirina daxwazên kurdan dikarin hevkariyên hilbijartinan pêk bînin. Herweha dikrin bi namzedên xwe jî beşdarî hilbijartinan bibin. Platformên Herêmî yên Bajarên Metropolên Tirkîyeyê, helbete ku dive ne bes ji bo hilbijartinan bêne avakirin, ew dikarin weke aktorên bi bandor û mayinde, li bajarên metropolê wazîfe û rola Organîzasyona Temsîla Kurdan jî bilîzin. Belê, bi vê bîr û bawerîyê, di hilbijartinên şaredarîyan yên 2024an de, ji bo em bi hev re, helwestek hevbeş pêşve bibin, me ev pêşniyarî û nêrîna xwe bi dezgehên sivîl, partîyên sîyasî û kesayetan re parve kir û em dê vê xebata xwe berdewam dikin. Em bangî hemû dezgehên sivîl, partî, tevger û grûbên sîyasî û kesayetên qebûlbar yên bajarên xwe dikin da ku bi armanca em bikaribin ji bo pêşeroja xwe rûpelekî nû vekin, bi diruşma ’’WERIN EM NAMZEDÊN XWE BI HEV RE TESBÎT BIKIN, WERIN EM BAJARÊN XWE BI HEV RE ÎDARE BIKIN!’’ em bi hev re gavê bavêjin. Ji bo gaveke weha em hîna jî dereng nemane.

# Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê

## Hêzên sînorî yên rêjîma Îranê welatiyekî Kurd kuştin




Hêzên hov ên sînorî yên rêjîma Îranê li devera "Bestam" a bajarê Seqizê de komek ji kolberan kirine armanca gulleyan û li encam de kolberekî temen 45 salî, hate kuştin.

Pêka rapora Rêkxirava Mafê Mirovî ya Kurdistanê, êwara Şemî 7ê Rêbendanê, hêzên sînorî yên rêjîma Îranê li devera sînorî ya "Bestam"ê ser bi bajarê Seqizê, hejmarek ji kolberan kirine armanca gulleyan ku li encamê de kolberekî Kurd ê bi navê "Mensûr Mihemednijad"ê temen 45 salî û xelkê gundê "Ciniyan"ê ser bi bajarê Seqizê, hatiye kuştin.

Pêka vê raporê gulleyek li mewdaya nêzîk ve bi "Mensûr Mihemednijat" kevtiye ku demûdest hatiye Kuştin.

Herwisa li vê raporê de hatiye ku hêzên sînorî yên rêjîma Îranê bê agehdarkirina berê teqe li wan kolberan kirine.

## Ciwanekî xelkê bajarê Seqizê kevte ber êrîşa tundajoyên Olî



Ciwanekî temen 20 salî xelkê bajarê Seqizê, ji aliyê tundajoyên Olî ve bi derba çeqûyan bi dijwarî hatiye birîndarkirin û piştere wan tundajoyan ku rêjîma Îranê piştevaniya wan dike, gef li malbata wî ciwanî jî xwarine.
Pêk zanyariyên ku Rêkxirava Mafê Mirovî ya "Kurdpa"yê belav kirine, "Nehro Rostemnijad" ê temen 20 salî, û xelkê bajarê Seqizê, li yek ji parkên bajarê Seqizê de rastî êrîşa çend kesên tundajo yên olî hatiye û bi derba çeqûyan bi ser û her 2 pêyên wî, bi dijwarî birîndar bûye.
Malbata "Nêhro Rostemnijad" bi awayê yasayî şikayet ji wan tundajoyên olî kiriye û belgefîlm û wêneyên peypwendîdar jî dane dadgehê, lê heta niha dadgehê bi tî awayekê pêregihîştin bi şikayeta ji wan girûpên tundajo nekiriye û bi rêya hinek kesan piştevaniya wan dike.
Herwisa Kurdpayê daye zanîn ku wan tundajoyên olî gef ji vê malbatê xwarine ku hekî lêxweşbûna xwe ji wan nedin dadgehê û şikayeta xwe ernegirin, ew dê çendîn kesên malbata wan bikujin.
Girûpên wiha tundajo bi piştevaniya rêjîma Îranê heta niha çendîn cinayetên hovane li bajarên Rojhilatê Kurdistanê de kirine ku rêjîmê heta niha ti kesek binçav an gazî dadgehê nekiriye.Li 3ê gelawêja Îsal de jî ciwanekî Kurd ê temen 35 salî yê bi navê "Farûq Reşîdî" xelkê bajarê Seqizê ji aliyê girûpên olî yên tundajo ve bi awayekî hovane hatibû kuştin ku rêjîmê ti lipeykletinek bo vê cinayetê nekiriye.

## Hêzên rêjîmê hovane kolberan îşkence dikin



Hêzên leşkerî yên rêjîma Îslamiya Îranê, Kolberek girtin û bi awayê herî dirindane bin derbên lêdan û Îşkencê de ev kuştin.
Gorî rapora Navenda Mafê Mirovî a Kurdistana Îranê, roja Çarşemiyê 11ê Rêbendanê, kolberek bi navê Cebar Weysî, xelkê gundê "Cocar" girêdayî bajarê "Selasê bawacanî" bi sedema giraniya birînên xwe yên ku bi hegera lêdan û îşkenceya ji aliyê hêzên dijî mirove rêjîmê ve lê kevtibûn, canê xwe ji dest da.
Ev kolbera roja 9ê Rêbendanê li nêzî sinûrê Newsûdê kevte ber teqa guleyên hêzên henga merzî, û bi giranî birîndar bû û kevte ber destê wan hêzên dirinde, Cebar Weysî bi wî halê birîndar, kevte ber lêdan û kutanê û hêzên rêjîmê Hestiê wî lavê Kurd bi derba lêdanê şikandin.
Cebar bi sedema giraniya birînên xwe û wan îşkencên hêzên rêjîma dîktator, roja Çwarşemiyê canê xwe ji dest da.
Herwisa li bajarê Banê de kolberek bi dest û çavên girêdayî bi awayekî hovane kutane û derbên gelek giran li wî kolberî dane ku bi sedema wan îşkence û kutanê, niha li nexweşxanê hatiye razandin.Pêka rapora Rêkxistina Mafê Mirovî ya "Kurdpa"yê, roja Sêşemî 10ê Rêbendanê, kolberekî Kurd ê bi navê "Bêhnam Şerîfiyan" ê temen 30 salî û xelkê bajarê Seqizê, li sînorê "Hengejal"ê ser bi bajarê Banê, ji aliyê hêzên leşkerî yên rêjîma Îranê ve hate girtin û wan hêzan piştî girêdana dest û çavên wî, bi awyê herî hovane bi derbên giran li wî xistine û bi çeka kilaşînkof, bi awayekî hovane derbên gelek giran bi wî kolberî dane. Pêka rapora "Kurdpa"yê, pê, navteng, pişt û serûçavên "Bêhnam" rastî derbeyên gelek giran hatine û bi sedema dijwariya wan derban li nexweşxaneya "Selahedîn Eyûbî" ya bajarê Banê de hatiye razandin.

# Agirî

◆ Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
◆ www.Kurdistanmedia.com
◆ www.Agirimedia.org
◆ rojnamaagiri@gmail.com
◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (463)